Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1018 | 30-Mijdar- 2022 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

## Akademî stûna perwerde û guherînê ne

**Pêkanîna guhertineke fikrî di civakan de ji wan akademiyan dest pê dike yên ku di belavkirin û pêşxistina rêbazên lêkolînê û pêkanîna armancên şoreşê de weke aliyê sereke tên hesibandin. 2 hezar û 233 jin û 225 mêr, di gelek dewreyên perwerdeyê yên girtî û vekirî yên 13 akademiyên jinan de li Bakur û Rojhilatê Sûriyê derçûn.**

Akademî, ji wan saziyên herî girîng in, yên ku di belavkirina fikrên neteweya demokratîk de bi roleke sereke radibin. Bi destpêkirina Şoreşa 19'ê Tîrmeha 2012'an li Bakur û Rojhilatê Sûriyê û avakirina Rêveberiya Xweser re, yekemîn navenda Akademiya Civaka Demokratîk li navçeya Rimêlanê bi navê "Dr. Nûrî Dêrsimî" hate vekirin.



Li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê 13 akademiyên jinan hatine vekirin. Ji wan, 8 akademiyên Kongra Star in ku bi navên "Star" tên nasîn. Her wiha 2 akademiyên girêdayî Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM); Akademiya Şehîd Rojbîn Ereb li Til Hemîsê û Akademiya Şehîd Zîlan Ereb li Minbicê hene. Ji bo Yekîneyên Parastina Jinê (YPJ) jî akademî hatin vekirin. Di heman demê de akademiyeke taybet a Hêzên Ewlekariya Hundirîn-Jin (Akademiya Şehîd Hîra) hatiye vekirin.

Ev akademî perwerdeyên li ser dîroka (Kurdistan, Sûrî, jin, jinên Kurdistanî, Rojhilata Navîn) didin da ku hişmendiya di zêhniyeta civakê de cih girtiye, biguherîne. Her wiha, ev mijar jî tên dayîn; civaka xwezayî, olên yekxwedayî, neteweya demokratîk, hêza serdest a navendî, desthilatdarî û rêveberiya demokratîk, sosyalîzm û kapîtalîzm, hevjiyana azad, çand, exlaq, qanûn, demokrasî, asîmîlasyon, qirkirina siyasî, ezmûna şerê gel ê şoreşgerî, şerê taybet, pirsgirêka Kurd û hevsengiyên netewe-dewleta li Rojhilata Navîn, çanda neteweya demokratîk, di neteweya demokratîk de pergala xweparastinê, modernîteya kapîtalîst.

Van akademiyan deriyên xwe vekirine li kesên ku dixwazin xwe bi pêş bixin. Di salên 2021-2022`yan de perwerdeyên girtî yên ku li van akademiyan hatin vekirin, gihiştin 25'an û di wan de 403 jin perwerde bûn. Hejmara perwerdeyên vekirî jî gihişt 94`an û di wan de hezar û 830 jin perwerde bûn.

Her wiha 4 dewreyên perwerdeyê yên girtî ji bo mêran hatin vekirin ku 76 mêr tev li wan bûn. 9 dewreyên perwerdeyê yên vekirî jî hatin birêxistinkirin ku 149 mêr tev li wan bûn. 21 dewreyên vekirî ku tê de 535 jin û mêr tev li bûbûn, hatin vekirin.

Dema van dewreyên perwerdeyê di navbera 15 ta 45 rojan de ye û ji aliyê kadroyên pispor ên Kongra Star û TEV-DEM`ê ve ders tên dayîn.

### Bi perwerdeyê guherîna hişmendiyê

Berdevka Komîteya Perwerdeyê ya Kongra Star, Bêrîvan Yûnis giringiya van dewreyên bi destê Kongra Star, nirxand. Bêrîvan Yûnis got, "Ev perwerde, zêhniyeta di nav civakê de biguhere û her wiha hewl bide hin pirsgirêkên bingehîn ku di nav salên dirêj de ava bûne û civakê weke çînan nirxandine jî çareser bike."

### Divê naverok û cewher hevgirtî bin

Bêrîvan Yûnis di dewamê de got, "Şoreşa me şoreşeke fikrî ye. Bi destpêkirina şoreşa li Rojavayê Kurdistanê, Bakur û Rojhilatê Sûriyê re me hewl da ku li ser bingeh û rêgezên neteweya demokratîk kesayeteke nû ava bikin. Heman tişt ji bo saziyên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk jî lê ye da ku naverok û cewher hevgirtî bin."

### Rêber Ocalan û fikrên wî yên demokratîk

Bêrîvan Yûnis bal bire ser pergala neteweya demokratîk ku ji komînê dest pê dike û wiha dewam kir: "Ji bo pênaseya wê, ked û têkoşîneke mezin pêwîst bû, ji ber ku hişmendiya desthilatdar di nava civakê de kûr bû. Lewma li gorî fikra Rêber Abdullah Ocalan me dest bi belavkirina fikrên demokratîk kir. Di hemû pergalên heyî de jin piçûk tê dîtin û civak jî li vê yekê temaşe dike. Her wiha ji bilî navmalê ti warekî jinê jî tine ye. Me bi van perwerdeyan xwest hişmendiya kapîtalîst a ku jin îstîsmar dikir û ew dikir amûra propaganda û reklamê, ji holê rakin. Ev jî bi rêya danasîna wê ya bi nasname û cewhera wê û paqijkirina kesayeta wê pêk tê."

Bêrîvan piştrast dike ku guhertineke bingehîn di kesayeta wan jin û mêran de çêdibe, yên ku tevlî dewreyên perwerdeyê dibin. *-ANHA*

## Aysha jina serhildêr a Efrînê ye

**Cengiz Akaygun, bi serpêhatiya keça Kurd a Efrînî a di kurtefilma Aysha de, bû namzetê Oscarê. Ew dibêje, "Heger di Oscarê de em bikevin nav sê filmên serketî û xelatê wergirin, ez ê bi destê Ayshayê bigirim û em ê bi hev re biçin merasîma xelatê. Ew keça serhildêr wê hîn bibe hêdîka derdê xwe bibêje, em jî, em ê hîn bibin guhdariya wê bikin."**



Derhêner û çêkerê filman Cengiz Akaygun bi filma xwe ya dawî Aysha bû mêvanê 40 festîvalan û ji 7 festîvalan jî xelat wergirtin. Filma derhênerê ciwan herî dawî li Festîvala Filmên Kurdî a Hamburgê a 13´an de jî xelata kurtefilma serketî wergirt. Filma Aysha wekî din kete lîsteya dirêj a (Longlist) a ji bo Xelatên Akademiyê (Oscar) yên 95´an. Armanca Cengiz Akaygun ew e ku bikeve lîsteya kurt (Shortlist) û bikeve nava sê kurtefilmên xelatê wergirin.

Di kurtefilmê de di nav a13 deqîqeyan de serpêhatiya Aysha tê gotin. Cengiz Akaygun dibêje, navê Aysha esas ew nave ku zêhniyeta bi gewdeyê DAIŞ´ê li keça Kurd kiriye. Herçî navê wê yê bi rastiye, li cem Cengiz Akaygun heye.

Akaygun heta niha 4 kurtefilm çêkirine. Ji bo fikra filma Aysha ew dibêje, "Çîroka filmê li ser têkoşîna keçeke Kurd e ku li Efrîna di bin dagirkeriya qirker de dijî. Qewimînên li Rojava her wiha gelek tesîr li zarokan jî kiriye; min bi Aysha temsîla wan di filmê de nîşan daye. Ez fikirîm, gelo ez li Efrînê zarokek bûma, beramberî zêhniyeta DAIŞ´ê lazim bûya ez li ser xwe bimînin, ka çi wê ji destê min bihata. Bi van hizr û hestan min berê xwe da çêkirina filmê."

### Bi Ayshayê re wê biçe

Li navenda çîroka filmê du zarok hene û her du jî di bin 12 salan de ne. Derhêner bi zarokên ji rêzê re kar kiriye. Cengiz Akaygun bextewer e ku Aysha ketiye nava bernamzetên xelatên Oscarê. Ew dibêje, "Min pirr hez dikir bi vê filmê celata Oscarê wergirim. Heger di Oscarê de em bikevin nav sê filmên serketî û xelatê wergirin, ez ê bi destê Ayshayê bigirim û em ê bi hev re biçin merasîma xelatê. Ew keça serhildêr wê hîn bibe hêdîka derdê xwe bibêje, em jî, em ê hîn bibin guhdariya wê bikin." Lîsteya kurt a filmên namzetên Oscarê wê 21´ê Kanûnê bê eşkerekirin.
*Ozgurpolitika*

## Hişyarbûyina bi kulîlk û nebatên hişkirî

Hunermenda Ingilîz, Rebecca Louise Law, bi kulîlk û nebatên ku hişk kirine, înstalasyonên pirr xweşik çêkirine. Wê ev kulîlk û nebatên hişkkirî, di wî mekanî de yê ku ew wan lê nîşanî xelkê dide, baş bi cih kirine û dema xelk bi vî awayî li kulîlk û nebatan dinihêre, hizreke cuda bi xelkê re çêdibe. Ew êdî bi çavekî din li van kulîlk û nebatên hişkkîrî dinihêrin. Yanî ew têkiliyên din bi van kulîlk û nebatên hişkkirin re datînin. Wê nebatên xwe ji esreqa xênî ber bi jêr berdane û di mekanê pêşangehê de atmosfereke balkêş daye avakirin. Pêşangeha wê ya dawî ya bi navê "Awakening" (Hişyarbûyîn) li Muzeya Hunerî ya Honolulu vebûye. Wê du salonên muzeyê ji bo karên xwe veqetandine û înstalasyonên xwe li wir nîşan dide. Ev yek ji bo serdêran jî cerebeyeke balkêş e û xelk xwe lê digirin. Wê gelek nebatên cuda hişk kirine ji bo pêşangeha xwe. Rebbecca Louise dide zanîn ku wê ev nebatên xwe li Hawaiyê hişk kirine. Ev pêşangeha wê, dê demeke dirêj li muzeyê were dîtin.



Her wiha li Îtalyayê jî hin xebatên we yên cuda niha tên nîşandan û ew jî înstalasyon in. Wekî din li Munchen a Elmanyayê jî, li " Muzeya Kunsthalle" înstalasyonên wê dê werin nîşandan.
*-Ozgurpolitika*

Sudoku:Pirs 28

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 2 | | | 1 | 7 | | | 9 |
| | | | 6 | 8 | 9 | | 5 | |
| | 9 | | | | 5 | | 3 | 7 |
| | | | | | | | | 4 |
| | | 5 | 8 | | 2 | 3 | | |
| 9 | | | | | | | | |
| 7 | 5 | | 1 | | | | 4 | |
| | 4 | | 2 | 5 | 8 | | | |
| 1 | | | 7 | 6 | | | 8 | |

Sudoku: Bersiv27

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 9 | 7 | 4 | 3 | 2 | 6 | 1 | 5 | 8 |
| 8 | 2 | 5 | 7 | 1 | 9 | 4 | 6 | 3 |
| 1 | 6 | 3 | 5 | 4 | 8 | 7 | 2 | 9 |
| 4 | 5 | 7 | 6 | 8 | 2 | 9 | 3 | 1 |
| 6 | 3 | 1 | 9 | 7 | 4 | 5 | 8 | 2 |
| 2 | 9 | 8 | 1 | 5 | 3 | 6 | 4 | 7 |
| 3 | 4 | 6 | 2 | 9 | 7 | 8 | 1 | 5 |
| 5 | 8 | 9 | 4 | 3 | 1 | 2 | 7 | 6 |
| 7 | 1 | 2 | 8 | 6 | 5 | 3 | 9 | 4 |




## Jinên Tîrêjên Rojê li faşîstan da


Înisîyatîfa Jinên Tîrêjên Rojê bi daxuyaniyekê salvegera 44'emîn a PKK'ê pîroz kir û diyar kir ku wan ji bo salvegera avabûna PKK'ê û li dijî tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, gelek çalakî kirin e. ***R-3***

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1018 | 30-Mijdar- 2022 | www.ronahi.net/ku/

# LI HEMBER GERÎLA BI BIN KETIN JI BER WÊ ÊRÎŞÎ ROJAVA DIKIN

Dewleta Tirk ya dagirker li hemberî vîna gerîlayên azadiyê têk diçin, tevî ku çekîn qedexekirî û kîmyawî jî li hemberî gerîla bikar tînin, lê gerîla bi îrade, bawerî û biryardariya serketinê ya Apoyî derbên giran li dagirkeran dixin. Dagirkerî ji bo têkçûna xwe ya li qadên gerîla veşêre, êrîşî Rojava dike.






## 'Têkoşîna li dijî dagirkeran erkê her kurdekî xwedî wijdan e'



Ezher Ehmed diyar kir ku êrişên dagirkeriya Tirk bi erêkirina Rûsya, Amrîka û hikumeta Şamê tên kirin û got, îro ji her kurdekî xwedî wijdan tê xwestin ku li dijî êrişan têkoşînê bikin. ***R-5***

## `Şerê Gelê Şoreşgerî riya serkeftinê ye`



Seroka Yekîtiya Jinên Ermenî Anahîd Qesabiyan da zanîn ku armanca êrişên dagirkeriya Tirk qirkirina gelên resen yên herêmê ye û got, Şerê Gelê Şoreşgerî û yekîtiya gelên herêmê riya serkeftinê ye. ***R-2***

## Bedran Çiya Kurd: Em neçarin li dijî êrişên hovane, bersiveke xurt û bi bandor bidin




Badran Çiya Kurd da xuyakirin ku, piştî têkçûna lîstika teqîna Iştenbolê, dagîrkeriya Tirkî êrişên xwe zêde kiriye û got, Tirkiyê bêdengiya navneteweyî weke erêkirinekê ji xwe re dibîne, em bang hikûmeta Şamê dikin ku li hember êrişên dagirkeriyê helwestek bi biryar nîşan bide. ***R-4***

## Tevî hemû zextan jî raperîna 'Jin, Jiyan, Azadî' didome



Herçiqas hêzên rejîma Îranê zextên xwe yên ji bo girtin û revandina çalakvan û xwepêşanderan zêde kiriye û bajar tîje leşker kirine jî, lê hîn raperîna, 'Jin, Jiyan, Azadî' bi çalakiyên cuda berdewam dike. ***R-3***



ÊRIŞ WÊ BIDOMIN, ...
DILYAR CIZÎRÎ *R-4*

Tirkiye, li Sûrî .......
Zekî Bedran *R-5*

# `Şerê Gelê Şoreşgerî riya serkeftinê ye`

Seroka Yekîtiya Jinên Ermenî Anahîd Qesabiyan da zanîn ku armanca êrişên dagirkeriya Tirk qirkirina gelên resen yên herêmê ye û got, Şerê Gelê Şoreşgerî û yekîtiya gelên herêmê riya serkeftinê ye.

Tevayiya pêkhateyên bakur û rojhilatê Sûriyê rastî êrîşên qirkirinê yên dagîrkeriya Tirkî tên. Herwiha di nava binpêkirineke eşkere ji pîvan û yasayên navdewletî û bêdengiya navdewletî ya li hember van kiryaran de, gelek herêm hatine dagîrkirin û heta niha jî gelek jê tên bombarankirin. Ji 19`ê vê mehê ve êriş û balafirên şer yên bêmirov yên dagîrkeriya Tirkî nehatine rawestandin. Tirkiyê di êrişên xwe de sivîl, leşker, jin û zarokan dike hedef. Rojane welatiyê herêmê ji ber êrişên hovane şehîd û birîndar dibin. Dema dawî jî navendên xizmetê û binsaziya herêmê dike hedef.

Derbarê rewşa herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê û êrişên dagîrkeriyê, seroka Yekîtiya Jinên Ermenî Anahîd Qesabiyan ji me re axivî û behsa gef û êrîşên dawî yên dewleta Tirk li ser herêmê kir. Anahîd got, bi nêzîkbûna bidawîhatina Peymana Lozanê, dê Tirkiye jî bi dawî bibe û piştî bidawîkirinê çi bike jî êdî nikare bighêje armanca xwe ya dagirkirina herêmê û tunekirina gelê wê. Ji bo wê jî niha êrişên xwe li ser herêmê zêde kiriye û hewl dide ku temenê xwe dirêj bike û peymana lozanê nû bike.



## `Teqîn bi destê îstixbarata Tirkiyê bû`

Anahid bal kişand ser armanca teqîna li Stenbolê û wiha pê da çû: "Teqîn bi destê îstixbarata Tirkiyê bû, lê Tirkiyê hêzên me yên leşkerî idîa dikir, da ku hiceta vê teqînê derfeta êrişkirina herêmên bakur û roojhilatê Sûriyê ji xwe re veke û balafirên xwe bi awayekî zêdetir bide şuxlandin. Herwiha vê dawiyê jî navendên xizmetguzariyê û deverên niştecihbûyî kir hedef, da ku gel bitirsîne û bê çare bihêle."

## `Serkeftin ya me ye, binketin para dagîrkeriyê ye

Anahîd derbarê armancên veşartî yên Tirkiyê di bombebarankirina binesazî û navendên xizmetguzariyê de jî wiha got: "Êrişên Tirkiyê bi baldarî tên kirin, herwiha Tirkiyê cihên taybet dike armanc, da ku jiyan li ser welatiyan qut bike û deriyê koçberiyê veke, herwiha herêmê vala bike. Lê gelê me ji



kurd, Ereb, Ermenî, Suryanî û Êzidî armanc û hewldanên dagîrkeriya Tirk li Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Rojava nas kirine. Ji bo wê jî li gorî van armancan, em dibînin ku gel haziriya têkoşînê dikin û heta niha li ser ax û milkên xwe mane, ev bi serê xwe destpêka serkeftinê ye. Ji bo wê jî em dibêjin, serkeftin ya me ye, binketin para dagîrkeriyê ye."

## `Bêdengiya civaka navdewletî derfetê dide dagîrkeran`

Anahîd da zanîn ku bêdengiya civaka navdewletî û rêxistinên mafên mirovan ji dagîrkeriyê re çira kesk e û ev yek li axaftina xwe zêde kir: "Ev bêdengî derfet dide dagîrkeran ku xaka bakur û rojhilatê Sûriyê dagîr bike. Em li aştî û diyalogê digerin, QSD ne li dijî diyalogê ye, lê li dijî binppêkirin û tinekirina mafê gela ye. Ji bo wê jî divê hêzên weke Rûsya û Amerîka, yan jî hikometa Şamê diyalogan bi Rêveberiya Xweser re bikin da ku bighêjin çareseriyekê aştiyê."

## `Şerê Gelê Şoreşgerî wê bi ser bikeve`

Anahîd di berdewamiya axaftina xwe de bal kişand ser pêwîstiya amadekarî û yekitiya gelê herêmê li hemberî êrişan û amaje bi wê yekê kir ku Şerê Gelê Şoreşgerî wê bi ser bikeve. Ji bo wê jî divê em ji her êrîşeke dewleta Tirk re amade bin. Serketinên gelê ku rêya azadî û biratiya gelan şopandine, wê dewleta Tirk tengav bike.

## `Li dora hêzên xwe bicivin û beşdarî Şerê Gelê Şoreşgerî bibin`

Seroka Yekitiya Jinên Ermenî Anahîd Qesbiyan di dawiya axaftina xwe de bang li gelê herêmê kir ku li dora hêzên xwe bicivin û beşdarî şerê gelê şoreşgerî bibin û azadî û destkeftiyên şoreşê biparêzin. Herwiha got, Ji tevayiya gelê herêmê tê xwestin ku li dora QSD û Rêveberiya Xweser bicivin, mal û milkên gel biparêzin, xwe bi axê ve girêbidin, nerevin û herêmê vala nekin. Em tev QSD'ê ne û emê di nava refên şer de amade bin.

# Kombûna Jinên Zenûbiya ji bo çareserkirina pirsgirêkên jinan dixebite

**Kombûna Jinên Zenûbiya ya li bajarê Hecîn ê Dêrezorê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê hewl dide pirsgirêkên li pêşiya jinan çareser bike.**

Piştî rizgarkirina Dêrezorê di sala 2019'an de û vekirina saziyên jinan ên ji bo ji holê rakirina tundiyê dixebitin, rewşa jinan li gundewarên Dêrezorê guherî. Yek ji van saziyan ya herî girîng Buroya Kombûna Jinên Zenûbiya ye ku di 11'ê Mijdara 2019'an de li Dêrezorê bi armanca destekdayina manewî û madî ji jinan re, çareserkirina pirsgirêkên wan û îspatkirina rola jinan di hemû qadên jiyanê de.

Têkildarî dozên tundiyê yên ku tên ofîsê û xebatên wan ên ji bo çareserkirina wan, endama Buroya Kombûna Jinên Zenûbiya Muna Ewêd wiha got: "Bi armanca rakirina şîdeta li ser jinan em hewl didin hişmendiyê belav bikin. Dozên ku tên ber destê me hemû pirsgirêkên malbatî ne, jin ji aliyê hevînê xwe an endamekî malbata xwe rastî tundiyê tê. Pirsgirêkên aborî jî tên ber destê me, bi darê zorê dihêlin jin kar bike da ku debara xwe û zarokên xwe bike. Her wiha pirsgirêkên weke zewaca di temenê biçûk de jî tên ber destê me. Em her du aliyan li hev dicivînin û li wan guhdar dikin û li gorî rêbazên yasayî hewl didin dozê çareser bikin."

Li ser kêşeyên li pêşiya xebata Kombûna Jinên Zenûbiya Muna Ewêd wiha anî ziman: "Di hin dozan de em rastî gelek zehmetiyan hatin û me ew sewqî dadgehê û dozgeriya giştî kirin. Em ê têkoşîna jinan li hemû herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê mezin bikin. di serî de têkoşîna li dijî tundiya li ser jinê û girîngiya rola wê ya di civakê de. Derbarê têkoşîna li dijî tundiya li ser jinan û girîngiya rola wê di civakê de em waneyan bidin. Di vê salê de derdora 313 doz hatin ber destê me."

## 'Wan dest bi lêdana min û zaroka min kirin'

Ji wan dozên ku hatine ber destê Kombûna Jinên Zenûbiya, doza S.M bû ya ji bo ku ji aliyê civakê ve neyê sûcdarkirin, bêdeng ma, lê di dawiyê de çareseriyek ji êşa xwe re nedît wiha got: "Ev ne cara yekê ye ku ez ji aliyê zarokên hevjînê xwe ve rastî tundiyê têm û ji ber ku êdî ez nikarim lêdam î şideta li min tê kirin tehmûl bikim min berê xwe da Kombûna Jinên Zenûbiya. Dema ku ez di odeya xwe de bûm, bê sedem zarokên hevjînê min êrişî min kirin û dest bi lêdanê li min û zaroka min kirin, heta ku cîranan mudaxele kirin û ew ji min dûr xistin. Berê min ji civakê şerim dikir û ji tirsa sûcdarkirinê min li wan gilî nedkir lê êdî nema karim vê rewşê tehmûl bikim."

L.M diyar kir ku ew ji aliyê hevjînê xwe ve rastî tundiya aborî tê, eger pereyên ku ji karê xwe distîne nede wî û ew dayika 8 zarokan e û wiha



axivî: "Ez û keça xwe ji bo ku em bikarin pêdiviyên malê dabîn bikin dixebitin, lê hevjînê min hemû pereyan ji me distîne û tiştekî li ser me xerc nake. Dema min red kir ku ez pereyan bidim wî, wî li min xist û min derxist derveyî malê. Ji ber vê yekê ez çûm Kombûna Jinên Zenûbiya û nakokiya di navbera min û hevjînê min de çareser kir." ***JÎNHA***



# Enternasyonalîstan klîba 'Çerxa Şoreşê' çêkirin

Şervanên enternasyonalîst ên YPG û YPJ'î yên li Rojavayê Kurdistanê, ji bo sala 45'an a Têkoşîna Azadiyê ya Kurd klîba 'Çerxa Şoreşê' amade kirin.

Bager Resîstencîa li ser amadekarî û armanca klîbê axivî.

Resîstencîa got, "Di klîbê de 3 hevalên Elman, yek Îrlandayî, yek Emerîkî, yek Çekyayî, yek Brezîlyayî û Kurdekî Mêrdînî dilîzin. Ya rast me xwe sala têkoşîna azadiyê ya 45'an bi yekbûneke xurt a bi fikrên neteweya demokratîk a Rêber Abdullah Ocalan pêşwazî bikin."

Bager Resîstencîa got, "Weke enternasyonalîstên li nava refên YPG û YPJ'ê me biryar dan ku klîbeke bi vî rengî amade bikin. Destpêkê me stran destnîşan kir. Me xwest ku stranek li ser Têkoşîna Azadiyê ya Kurd be. Me dixwest di salvegera 10'an a Şoreşa Rojava de vê projeyê pêk bînin. Lê belê ji ber êrîşên heyî em neçar man ku taloq bikin. Ji ber ku weke hêza leşkerî diviyabû me wezîfeya xwe ya esasî pêk bianiya."

## 'Me hewil dan ku her aliyê jiyanê nîşan bidin'

Resîstencîa têkikdarî pêvajoya prova û amadekariyê got, "Hevala Berçem a ku di klîbê de cih digire, ji ber ku ji muzîkê fêhm dike pêşengî ji provayan re kir. Me demekê bi hev re prova kir. Piştre jî li studyoyekê stran got. Me li ser nîqaş kir ku ji bo vê karin klîbeke çawa çêbikin. Weke enternasyonalîstên YPG û YPJ'î me xwest klîbek welê be ku têkiliya me ya civakî û armanca me ya ku ji bo wê em têdikoşin, nîşan bidin. Li şûna tenê aliyên şer, me xwest ku her aliyên jiyanê di klîbê de nîşan bidin."

## 'M e xwest bala raya giştş ya cîhanê bikşînin ser Kurdistanê'

Resîstencîa destnîşan kir ku ew dixwazin êrîşên li ser Kurdistanê nîşanî cîhanê bidin û got, "Ya rast bi rêya vê klîbê me xwest balê bikişînin ser têkoşîna bênavber a 45 salan a li Kurdistanê. Di rewşa heyî de bala raya giştî ya cîhanê li ser şerê Ûkrayna-Rûsyayê ye. Me xwest balê hinekî bikişînin ser êrîşên li ser Kurdistanê. Ji ber ku li Kurdistanê her roj çekên kîmyewî û qedexekirî têne bikaranîn. Li hemberî vê yekê bêdengî heye. Her wiha dixwazin ku êrîşên li ser Rojava bêhtir berfireh bikin. Me xwest rewşa li Kurdistanê bi berhemeke hunerî nîşanî raya giştî ya cîhanê bidin. Ji ber vê yekê me jêrnivîsa klîbê bi zimanê Îngilîzî amade kir, ku karibin xwe bigihînin hîn bêhtir girseyeke berfireh."

## 'Fikrên Rêber Abdullah Ocalan ji bo tevaiya cîhanê girînge'

Têkildarî aliyê ku klîb bi dirûşmên "Bijî Serok Apo" û "Bijî Berxwedana Rojava" bi dawî dibe, Resîstencîa got, "Bi dirûşmên ku me di dawiya klîbê de berz kirin; dirûşmên 'Bijî Serok Apo' û Bijî Berxwedana Rojava' me xwest nîşan bidin ku fikrên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji bo tevahiya cîhanê çiqasî girîng e. Bûye destaneke têkoşînê ku beriya nîv sedsalê bi Hakî Karer û Kemal Pîran destpê kir û îro tevahiya cîhan xwedî lê derdikeve. Lewma ji her demê bêhtir divê em ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo têbikoşin.

Bi dirûşma 'Bijî Berxwedana Rojava' me nîşan da ku piştî hilweşîna Yekîtiya Sowyetan, jiyaneke azad pêkan e. Şoreşa Rojava ku ronahiya şoreşa jiyana azad a ji tevahiya cîhanê re ye, raxist pêş çavan ku jiyaneke azad dikare pêk were. Şoreşa Rojava ji bo jinan gelekî girîng bû. Ji ber ku şoreşeke jinê bû. Bi şoreşê re jinên ku li malê dihatin ragirtin êdî li her qada civakê bi rengekî azad kar kir."



## 'Li dijî êrişên hovane xwedî lio têkoşînê derkevin'

Di dawiya axaftina xwe de Bager Resîstencîa banga xwedîderketina li Têkoşîna Azadiyê ya Kurdistanê kir û got, "Em bang li raya giştî ya cîhanê dikin ku xwedî li Têkoşîna Azadiyê ya Kurdistanê derkeve ku di sala 45'an de jî êrîşên hovane û neexlaqî li dijî wê tê kirin. Em bang li enternayonalîstên li tevahiya cîhanê dikin ku bên qada Şoreşa Rojava û bibin hevparê têkoşînê." ***ANF***

# Ji bo pirtûkên Kurdî Makpirtûk

**Malpera bi navê Makpirtûk ku navenda wê li Elmanyayê ye dest bi karên xwe kir. Malper bi armanca ku ji xwînerên Kurdî re bibe bersiv û vê kêmasiya xwe gihandina pirtûkan ji holê rake vebû. Makpirtûk dixwaze di navbera xwîner û berheman de bibe pirek.**

Malpera pirtûkên Kurdî "Makpirtûk", bi dirûşmeya "derguşa pirtûkên kurdî" hatibû damezirandin. Wê niha ragihand ku êdî pergala wan ji bo pirtûkkirrînê û xwe gihandina berheman, temam bûye û niha her kesê ku li Ewrûpa û dîsporayê, dikare xwe bi awayekî hêsanî bigihîne pirtûkên Kurdî. Malper bi sê zimanan, Elmanî, Kurdî û Ingilîzî hatiye avakirin ji bo hemû welatan kargoyan rê dike û her wiha hemû rêbazên peredayinê jî guncaw kiriye da ku xelk zehmetiyê nekişînin û bi rehetî pirtûkên dixwazin, bikirin. Yanî wan di vî warî de pergaleke navneteweyî ava kiriye û qederê 15 hezar pirtûkî li malpera xwe bar kirine.

Ew li ser navê malperê "Makpirtûk" jî gelekî fikirîne û herî dawî ev nav hilbijartine. Piştî gelek pêşniyaz û niqaşan, biryar dane vî navî lê bikin. Sebeba vî navî jî wiha diyar dikin, "Piştî pêşniyazan em her tim li 'Mak'ê vedigeriyan. Li gel hewldanên pozîtîf yên ji bo xwendina bi Kurdî, derûdora me û ciwanên ku zarokên wan nû çêbûbûn ji ziman û çîrokên Kurdî dûr ketibûn. Xaya me ji vî navî, ziman e."

## Dibe pireke navbera xwîner û berhem

Navenda makpirtuk.de li Elmanyayê ye. Wê ragihand ku wan dest bi karên xwe kiriye û ji bo hemû welatên Ewrûpayê pergalek ava kiriye da ku xwînerên Kurdî, xwe bigihînin pirtûkên Kurdî û bixwînin. Makpirtûk xwe di navbera xwîner û berheman de weke pirekê bi nav dike. Wê di daxuyaniya xwe ya ser medyaya civakî de got; "Me divê di serî de dîyar bikin ku em bi navê MakPirtûk.com pirtûkfroşiya online dikin. Navenda me li Elmanyayê ye. Em dixwazin her çi berhemên Kurdî û yên derbarê Kurdan de hebin, di demeke kin de bigihînin ber destên xwîneran. Qada xebata me bi taybetî hemû welatên Ewrûpayê ne. Herwisa li gor daxwazê em dê xwe bigihînin xwînerên Kurdî yên li seranserê cîhanê jî. Xwînerên me li kîjan welatên cîhanê bin em dê bi rêyên herî guncav ji wan re bibin bersiv û em dê xwestekên wan yên pirtûkan bigihînin ber destên wan. Bi vî şiklî em dê pireya di navbera xwîner û berhemên kurdî xurt, rêyên asê hêsan û kurt bikin."

## Nexasim ji bo Kurdên dîasporayê

makpirtuk.de zanîn ku li dîasporayê, xwe gihandina pirtûkên Kurdî gelek zehmet bûye û wan jî xwestiye vê meseleya hanê hal bikin yan jî sivik bikin: "Meseleya me ya dest pê kirina karekî wiha her ji me dest pê kir û me nedikarî bi rehetî em xwe bigihînin pirtûkên Kurdî. Em wekî çend ciwanên Kurd ên ku li Ewrupayê dijîn, gava me berê xwe da xwendina edebiyata Kurdî û metnên Kurdî em yekser rûbirûyê astengiyekê hatin ku ew zehmetiya bidestxisitina wan cure berheman bû. Gava me ji derdora xwe pirsî, em jê haydar bûn ku bi kêmanî beşek mezin a Kurdên dîasporê di vî warî de zehmetiyan dikşîne. Fikra avakirina makpirtûkê ji vê hayjêhebûnê çêbû."

## Ji hemû weşanxaneyan nimûne hene

Makpirtûk ji bo karibe vî karî bi rêk û pêk bike, piştî xebatên dûr û dirêj xwe gihandiye gelek weşanxaneyên Kurd û pirtûkên ku wan çap kirine li malpera xwe bar kirine. Niha bi riya malperê, kesên li Ewrûpayê, dikarin xwe bi hêsanî bigihînin pirtûkan. Makpirtûk li endişeyê hêvî û motivasyona xwe ya vî karî wiha dide der: "Divê were gotin ku li rex endîşeya bazirganiyê motîvasyona me ya sereke ew e ku em pirtûkên zimanê xwe bi rehetî bigihînin ber destên miletê me yê vê derê ku bi fikra me ev yek dê sîrkulasyonek baş çêke di navbera van kesan de û îhtimal e rê li ber gelek xebatên çandî-edebî veke. Niha hema bêje, me ji hemû weşanxneyên Kurdî pirtûk berhevkirine û wan li malpera xwe bar dikin. Piştî ku ev kar qediya em ê bi awayekî profesyonel û motîvasyoneke bilind dest bi karê xwe bikin. Em hêvî dikin ku MakPirtûk bibe dilopek biçûk li warê xwendin û lêkolînên Kurdî."- ***Ozgurpolîtîka***



# Ji ber êrişên dagirkeriyê li herêmê gaz û kehrebe qut in

Di encama topbarana dewleta Tirk a dagirker de zirarên mezin gihaştin kargeha gazê ya gundê Siwêdiyê ku çavkaniya sereke ya gaza Bakur û Rojhilatê Sûriyê û kehrebeya herêma Cizîrê bû, mudîrê kargehê destnîşan kir ku ew ji bo çêkirina wê dixebitin.

Ji şeva 19-20'ê Mijdarê ve artêşa Tirk a dagirker Bakur û Rojhilatê Sûriyê topbaran dike, di encamê de ziratên mezin gihaştin saziyên xizmetguzariyê, kargehên mirovî, tenduristî û kargehên petrolê yên herêmê.
Di roja 4'ê ya topbaranê de (23'ê Mijdarê) artêşa Tirk a dagirker kargeha gazê ya gundê Siwêdiyê ya başûrê navçeya Dêrikê ya Kantona Qamişlo kir hedef û di encamê de kargeh rawestiya û gaz li seranserî Bakur û Rojhilatê Sûriyê û kehrebe li herêma Cizîrê qut bû.
Kargeha gazê ya Siwêdiyê çavkaniya tekane ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê ya gaza malan e, her wiha stasyona derxistina kehrebeyê ya Herêma Cizîrê (Kantonên Qamişlo û Hesekê).

Zirarên ku gihîştine kargehê hatin şopand, karmendan destnîşan kirin



ku kargeh berî topbaranê rojane bi hezaran tûpên gazê hildiberandin.
Arka kargehê
Mudîrê kargehê Egîd Ebdulmecîd wiha axivî: "Kargeh ji bo herêmê pir girîng e, ji ber ku ew ji tevahiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê re gaza malan (RBC) û ji Herêma Cizîrê re kehrebeyê peyda dike."

**`Bi rêjeya ji sedî 40 kehrebe bi gaza kargeha Siwêdiyê ve girêdayî bû`**

Ebdulmecîd wiha domand: "Ji bo derxistina kehrebeyê pêwîstî bi gazê heye, ew gaz jî bi rêjeya ji sedî 40 ji gaza kargeha Siwêdiyê bû. Lê ji ber topbaranê gaza pêwîst ji derxistina kehrebeyê re qut bû."

Ebdulmecîd da zanîn ku kargehê û stasyonên din ji bo Herêma Cizîrê 130 mêgawat kehrebe peyda dikir. Lê piştî topbarana dewleta Tirk a dagirker a li ser kargehê û gelek stasyonên din, niha kehrebeya ku digihîje Herêma Cizîrê tenê 40 mêgawat e û got: "Heta em kargehê careke din bixebitînin, em dê di aloziyeke kehrebeyê re derbas bibin."

Ebdulmecîd wiha li axaftina xwe zêde kir: "Kargeh kevin e, şîrketên ku parçeyên pêwîst çêdikirin jî êdî rawestiyane; ji ber wê jî me ew parçe ji şîrketên din xwestin û wan jî diyar kir ku piştî nêzî 2 salan ew parçe dê peyda bibin. Di encamê de, zirar pir e û ji bo xebitandina vê kargehê û peyda-



kirina gazê ji bo herêmê derfetên mezin pêwîst in."

**`Anîna gazê ji derve nirxê tûpê bilind dike`**

Egîd Ebdulmecîd wiha got: "Di vê rewşê de em neçar in ku gaza malan ji derve bînin ku nirxê wê bi 5 caran bilindtir e. Tûpê gazê bi 5 hezar lîre bû. Lê lêçûna anîna tûpê ji derve 25 hezar lîre ye. Em hewl didin depoya gazê ya li cem xwe ji bo rewşên awarte bihêlin."
***ANHA***

# 11 kargeh tevî ambargoyê jî derfetên kar peyda dikin

**Li gel ambargoya ku li ser herêmê hatiya ferzkirin, Rêveberiya Xweser 11 kargeh vekirine. Ev kargeh derfetên kar ji zêdetirî 2 hezar kesî re peyda dikin.**

Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê di çarçoveya plana aboriyeke hevgirtî de û ji bo dabînkirina rêgeza xwetêrkirinê gavên nû diavêje.
Rêveberiya Xweser a di Îlona 2018`an de hate damezirandin û bi derfetên xwe yên xweser û tevî êrişên dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê jî herêmê bi rê ve dibe.
Rêveberiya Xweser di çarçoveya xebatên xwe yên aboriya civakî de, gelek kargeh vekirine û derfetên kar ji welatiyan re peyda dike. Her wiha bandorên ambargoya li ser herêmê kêm dike.
Endamê rêveber ê Rêveberiya Kargehên Bakur û Rojhilatê Sûriyê Mensûr Mehmûd diyar kir ku piştî aloziya ku li herêmê dest pê kir û ruxmî tengasiya aboriya cîhanê jî, Rêveberiya Xweser dest bi destekdayîna qadên aborî kir.



Mensûr Mehmûd da zanîn ku piştî nîqaş û lêkolînên berfireh Rêveberiya Xweser dest bi avakirina kargehan kir da ku bandorên aloziya aborî ya li Sûriyê bi giştî kêm bike. Her wiha got, di saya van kargehan Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi qasî herêmên din bandora aloziya aborî li ser çênebûye.

Rêveberiya Xweser desteka diravî da gelek projeyan, cihên guncaw ji wan re veqetandin, avahiyên wan restore kirin.

11 kargeh vekirin

Rêveberiya Xweser 11 kargeh li herêmê vekirin; Kargeha Zozan a Mast û Penêr li Dêrikê, Kargeha Êm a Cizîrê 1, Kargeha Êm a Cizîr 2 li Qamişloyê, Kargeha Êm li Reqayê, Kargeha Zeyta Nebatî li Qamişloyê, Kargeha Tekstîlê li Hesekê, Kargeha Çêkirina Kartonan li Hesekê, Kargeha Çêkirina Xortimên Çandiniyê li Hesekê, Kargeha Xwê li Hesekê û Kargeha Pembo li Hesekê.

Di van kargehan de 2 hezar û 335 kes dixebitin.
Rêveberiya Xweser û Rêvebirina Kargehan girîngiyê dide berhemên sereke û stratejîk wekî xwarin û cilan. Ji ber ku buhayê anîna wan ji derve bilind e.

Mehmûd diyar kir ku cotkar sûdê ji firotina hilbirînên xwe ji bo Rêveberiya Xweser digire û wiha got: "Cotkar pembo difiroşin Rêveberiya Xweser, piştre ji bo kargehê tê veguhestin. Tovên wê jî ji bo kargeha zeytê tê şandin û zeyt jê tê derxistin. Ev yek rê li ber anîna zeytê ji derve digire. Her wiha êm jê tê derxistin ku sewalkar sûdê jê digirin."

Rêveberiya Xweser zehmetiyên anîna madeyan ji derve dikişîne. Mensûr Mehmûd li ser vê yekê wiha got: "Em madeyên ku nayên peydakirin wekî makîne û hin madeyên bingehîn ji derve tînin. Sedema van astengiyan siyasetên plankirî yên li dijî Rêveberiya Xweser e."

Mehmûd her wiha got: "Em di rêvebirina kargehan de me rêvebirina kalîteya hilbirînê aktîf kir da ku karibe bi yên derve re



pêşbaziyê bike û madeyan bi kalîteyên baş û pîvanên cîhanî bişînin piraniya dewletên derdorê. Kalîteya hilbirînê wê bandorekê li bihayê madeya bike, heman demê em rewşa debarê ya şêniyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê di ber çavan re derbas dikin."

**Projeyên Pêşerojê**

Mensûr Mehmûd bal kişand ser projeyên pêşerojê jî û wiha got: "Me hinek proje pêşniyar kir û ji aliyên têkildarî re şandin da ku lêkolîn bikin û li gorî budceya Rêveberiya Xweser wê hinek proje werin erêkirin. Ji wan projeyan; kargeheke taybet a çêkirina tayên kitan û pembo ye. "
Li gel van kargehan Rêveberiya Xweser destekê dide vekirina kargehên taybet wekî xwarin, derman û cilan. ***ANHA***



# HPG: 4 dagirker hatin cezakirin

Di çalakiyên Gerîlayên Azadiyê de 4 leşkerên Tirk ên dagirker hatin cezakirin, herwiha çeperek A-4 hatiye îmhakirin û droneyeke ku îmha kiribûn.

**Navenda Nûçeyan**

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê bi daxuyaniyekê diyar kir ku di encama çalakiyên hêzên wan de 4 dagirker hatin cezakirin, çeperek A-4 hatiye îmhakirin.

HPG'ê di daxuyaniya xwe de diyar kir ku di 28'ê Mijdarê saet di 16:00 û 16:30'î de li Qada Berxwedanê ya Sîdayê, tîmên wan yên bi tevger ên YJA Starê 2 caran bi çekên giran li dagirkeran xistin. Di encama çalakiyan de 3 dagirker hatin cezakirin. Herwiha di 26'ê Mijdarê saet di 11:10'ên de li Qada Berxwedanê ya Girê Amediyê tîmên wan yên bi tevger bi çekên giran li dagirkeran xistin. Di encamê de çeperek ji çeka A-4 îmha kirin.

HPG'ê ragehand ku di 28'ê Mijdarê saet di 04:30'î de li Qada Berxwedanê ya Girê Cûdî tîmên wan yên bi tevger ên YJA Starê bi sûîqestê li dagirkeran xistin. Di encamê de dagirkerek hate cezakirin. Herwiha di 28'ê Mijdarê saet di 08:30'î de li Qada Berxwedanê ya Girê Cûdî sîstemeke kamera ya mobesse ji aliyê tîmên wan yên bi tevger ve hate îmhakirin.

HPG'ê da zanîn ku di 28'ê Mijdarê saet di 10:00 de li Qada Berxwedanê ya Girê Cûdî, tîmên wan yên bi tevger dest li dagirkeran werdan ku dixwestin bi teqemeniyan bombeyan li çeperên şer bibarînin. Dagirker piştî vê destwerdanê neçar man vekişin. 20 kîlo teqemeniya dagirkeran jî ji aliyê hêzên wan ve hate desteserkirin. Di 28'ê Mijdarê saet di 13:00 û 16:30'î de li Qada Berxwedanê ya Girê Cûdî, tîmên wan yên bi tevger 2 caran bi çekên nîv otomatîk li dagirkeran xistin. Di 28'ê Mijdarê saet di 15:30'î de li Qada Berxwedanê ya Girê Cûdî droneyeke dagirkeran ji aliyê tîmênwan yên bi tevger ve hate xistin. Hêzên wan dest danîn ser vê droneyê. Herwiha di 28'ê Mijdarê saet di 16:30'î de li Qada Berxwedanê ya Girê Cûdî, tîmên wan yên bi tevger bi çekên nîv otomatîk li dagirkeran xistin.
HPG'ê da xuyakirin ku di 28'ê Mijdarê li Qada Berxwedanê ya Girê Cûdî, çeperên şer ên li Şehîd Yûnûs 4 caran, çeperên şer ên li Şehîd Çekdar jî 3 caran bi bombeyên qedexekirî hatin bombekirin. Herwiha di 28'ê Mijdarê Qadên Berxwedanê yên Kurojahro, Şehîd Fedakar, Girê Cûdî û Girê Amediyê 32 caran bi helîkopterên



êrîşê hatin bombekirin. Di 28'ê Mijdarê Qadên Berxwedanê yên Çemço, Girê Amediyê, Girê Cûdî û Girê FM'ê bi dehan caran bi obus, tank û çekên giran hatin bombekirin.

# Jinên Tîrêjên Rojê li faşîstan da

**Navenda Nûçeyan**

**Înisîyatîfa Jinên Tîrêjên Rojê bi daxuyaniyekê salvegera 44'emîn a PKK'ê pîroz kir û diyar kir ku wan ji bo salvegera avabûna PKK'ê û li dijî tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, gelek çalakî kirin e.**

Înisîyatîfa Jinên Tîrêjên Rojê bi daxuyaniyeke nivîskî diyar kirin ku wan li Colemêrgê, Mêrsîn, Sakarya, Tekîrdag û Kocaelî çalakiyên bibando kirine.
Înisîyatîfa Jinên Tîrêjên Rojê di daxuyaniya xwe de diyar kirin ku di 26'ê Mijdarê de li navçeya Avcilara Stenbolê 2 wesayîtên luks û dikana nalbûriye yê faşîstê AKP'yî yê bi navê Serdar Alali ji aliyê yekîneyên wan ve hatin şewitandin. Herwiha di 27'ê Mijdarê de li Başakşehîra Stenbolê 5 wesayîtên luks ên faşîstan ji aliyê yekîneyên wan ve hatin şewitandin.
Înisîyatîfê da zanîn ku di 28'ê Mijdarê de li navçeya Toroslarê ya Mêrsînê yekîneyên wan bi teqemeniyên bi destan hatine amadekirin li marketa A101 û Şokê ya rejîma faşîst a Tirk dan. Di her du marketan de xisareke mezin çêbû. Herwiha di 28'ê Mijdarê de li navçeya Sapancayê ya Sakaryayê yekîneyên wan ji du milan bi çekan û teqemeniyên bi destan li wesayîteke polîsan dan. Di vê çalakiyê de polîsekî ku gule li serî ket, miriye.
Înisîyatîfê da xuyakirin ku di 26, 27, 28'ê Mijdarê de Stenbol, Tekîrdag, Kocaelî û Mêrsîn di serî de li gelek bajaran yekîneyên wan




bi hemwextî bi wesîleya salvegera 44'emîn a PKK'ê bi fîşekên hewayî çalakî kirine. Di 25 û 26'ê Mijdarê de li taxên Kişlaya Kevn û Mezarlikê ya Geverê û li taxên Medya, Aşitî û Sanayî yên Qosera Mêrdînê li ser dîwaran nivîs hatine nivîsandin."
Înisîyatîfê di daxuyaniyê de salvegera 44'emîn a PKK'ê pîroz kir û diyar kir ev çalakî ji bo salvegera avabûna PKK'ê û li dijî tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hatine kirin.

# Tevî hemû zextan jî raperîna 'Jin, Jiyan, Azadî' didome

**Herçiqas hêzên rejîma Îranê zextên xwe yên ji bo girtin û revandina çalakvan û xwepêşanderan zêde kiriye û bajar tîje leşker kirine jî, lê hîn raperîna, 'Jin, Jiyan, Azadî' bi çalakiyên cuda berdewam dike.**

Li bajarê Sine û Abdanan ên Rojhilatê Kurdistanê duh careke din ciwan daketin kolanan û çalakiyên nerazîbûnê lidarxistin. Herwiha li hinek zanîngehen Rojhilatê Kurdistanê, bi taybet li Sine xwendevanan çalakî û nerazîbûnên xwe berdewam kirin. Di nava bajaran de hêzên Îranê gelek bend danîne û ji bo girtin û binçavkirina xwepêşandanan di nava liv û tevgerê de ne.




Duh li bajarê Sine 4 endamên malbarekê ku ji 2 xwişk û 2 bira pêk tên yên bi navê Afaq, Şemsê, Perwîz û Xesrew hatin girtin.
Li bajarê Mehabatê jî cenazeyê Şoreş Nîknam ku ji berî niha di xwepêşandanan de hatibû qetilkirin, bi tevlîbûna dehan kesan li gundê Qelacuxe hate veşartin.




Li bajarên Îranê jî, beşek ji xwendevanên zanîngeh û peymangehan xwepêşandanên xwe berdewam kirin û nerazîbûn nîşan dan. Herwiha li hinek herêmên Tehranê jî çalakiyên cuda hatin kirin.
Herwiha beşek ji karker û şofêrên barhilgir li bajarên weke Kirmaşan,



Esefehan, Şîraz, Kaşan û Bender Ebas gireva xwe berdewam kirin. Herwiha 4 rêxistinên teqawîtê, piştgirî dan xwepêşandanan û daxwaz kirin ku dawî li cudakariya zayendî ya li welat were û demildest hemû girtî werin berdan û kesên destê wan li bêdengkirin û êşkencekirina xwepêşanderan de



hene werin girtin û dadgehkirin. Her çar rêxistinan hişyarî dan ku eger guh nedin daxwazên xwepêşanderan, wê bi hêzê nekarin dengê kolanan bêdeng bikin û wê xelk bi tundî bersiv bidin. - ***ROJNEWS***

# Bedran Çiya Kurd: Em neçarin li dijî êrîşên hovane, bersiveke xurt û bi bandor bidin

Badran Çiya Kurd da xuyakirin ku, piştî têkçûna lîstika teqîna Istenbolê, dagîrkeriya Tirkî êrîşên xwe zêde kiriye û got, Tirkiyê bêdengiya navneteweyî weke erêkirinekê ji xwe re dibîne, em bang hikûmeta Şamê dikin ku li hember êrîşên dagirkeriyê helwestek bi biryar nîşan bide.

**Darîn Silê/Qamişlo**

Êrişên ku dewleta Tirk ya dagirker li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê pêk tîne, ne êrişên nû ne, lê êrişên vê dawiyê bi armanca qirkirina sivîlan û xirabkirina binesaziya herêmê, herwiha belavkirina tirs û tevlîheviyê di nav gelên herêmê de pêk tên. Êrişên dewleta Tirkî ya dagirker ji 19’ê Mijdarê ve, bi awayekî hovane li ser herêmên cûda yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê berdewam dikin.

Derbarê rewşa dawî ya bakur û rojhilatê Sûriyê û zêdekirina êrişên dagîrkeriyê hevserokê Desteya Têkiliyên Derve yê Rêveberiya Xweser Badran Çiya Kurd ji me re axivî.

`Armanca Tirkiyê qirkirina gelên Sûriyeyê bi giştî ye`

Badran Çiya Kurda bal kişand ser cihên ku ji aliyê artêşa Tirk ya dagîrker ve tên hedefgirtin û wiha got: “Armanca Tirkiyê qirkirina gelên Sûriyeyê bi giştî ye. Lewra ne kurd tenê li ser vê xakê dijîn. Li kêleka kurdan bi hezaran gelê ereb, ermen, suryan û tirkman hene. Tirkiyê bi riya êrişên xwe yên hovane hewl dide sivîlan tine bike û navendên xizmetê yên li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê xirab bike. Ji bo wê jî di êrişên xwe yên vê dawiyê de gelek cihên ku xizmeta gelê herêmê dikin hedef girt, wek embarên genim, rawestgeha elektrîkê, nexweşxane û dibistanên perwerdeyê. Ev yek zagonên navdewletî binpê dike. Herwiha hêzên garantor jî li hember vê rewşê helwesta xwe diyar nakin. Ev yek nîşan dide ku dibe ku di demên pêş de êriş bi rengekî zêdetir berdewam bikin.”

`Ji bilî zêdekirina êrişan ti rê li pêşiya Erdogan nemaye`

Badran behsa sedema êrişên dawî yên li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê kir û wiha pê da çû: “Tirkiye rastî gelek pirsgirêkên navxweyî tê. Dibe ku hevpeymaniya partiyên desthilatdar di hilbijartinan de têk biçe. Ji ber vê yekê Erdogan dest bi lîstikên siyasî û ewlehî kiriye û ji bo ku Hêzên Sûriya Demokratîk reş bike teqîneke mezin li bajarê xwe pêk anî. Lê rastiya vê teqînê diyar bû û idîayên Erdgan vala derketin. Ji bo wê jî ji bilî zêdekirina êrişan ti rê li pêşiya Erdogan nemaye. Lewra berê xwe da êrişeke nû li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê. Ev yek jî diyar dike ku ew ber bi dawiya xwe ve diçe û ji tirsa binketina xwe serî li rêbazên



xwînrij û hovane dide, da ku xwe ji hilweşînê rizgar bike.”

`Divê hikûmeta Şamê li dijî dagirkeriyê helwesteke bi biryar nîşan bide`

Bedran bal kişand ser hedefgirtin û kuştina leşkerên girêdayî hikûmeta Şamê û axaftina xwe wiha domand: “Ev ne cara yekê ye ku dagîrkeriya Tirkî leşkerên girêdayî hikûmeta Şamê li bakur û rojhilatê Sûriyê û gundewarên Helebê armanc digre. Li dijî vê jî hikûmeta Şamê bêdeng dimîne û ev bêdengî bi bandora Rûsyayê ya li Sûriyê û danûstandinên ewlehî û



îstixbaratê yên di navbera Tirkiye û hikûmeta Şamê de girêdayî ye. Herwiha got, Divê hikûmeta Şamê li dijî dagirkeriyê helwesteke bi biryar nîşan bide. Em jî amadene ku li kêleka hikûmeta Şamê parastina xaka Sûriyê bikin. Da ku Tikî vê xaka Sûriyê parçe û dagîr neke.”

`Tirkiye her demê berê xwe dide şer û ji diyalog û aştiyê re ne amade ye`

Bedran diyar kir ku Rêveberiya Xweser hewl dide çareseriyeke aştiyê ji vê rewşê re bibîne û ev yek li axaftina xwe zêde kir: “Em di Rêveberiya Xweser de hertim li ser aşitî û çareserkirina nakokiyan dixebitin. Heriwh em danûstandinan bi hêzên çalak yên di dosyaya Sûriyê de ne dikin û hewl didin ku bi rêyên aştiyê aloziya Sûriyê çareser bikin. Lê Tirkiye her demê berê xwe dide şer û ji diyalog û aştiyê re ne amade ye. Hewl dide senaryoyên dagîrkirina axa Sûriyê dubare bike. Ev yek jî ziyanê digihîne berjewendî, yekîtî û ewlekariya Sûriyê. Herwiha Dagîrkirina hin herêm û bajarên din li Sûriyê tê wateya berdewamkirina dabeşkirina Sûriyê.”

`Pêwîste Rûsya û Emerîka helwesta xwe derbarê êrişan de zelal bikin
`

Badran diyar kir ku Balafirên bêmirov yên Tirkiyê yên ku ji roja destpêkê ve derbasî esmanê Sûriyê bûne, tev bi erêkirina hêzên garator in û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Ev balafir bêyî agahdarî û erêkirina hêzên çalak derbasî asîmanê Sûriyê nabin. Lewra pêwîste Rûsya û Emerîka helwesta xwe ya derbarê erêkirina pêkanîna êrişan de zelal bikin û li gorî peymanan ku di 2019`an de bi Tirkiyê re îmze kirin tev bigerin. Ji bo wê jî divê Rûsya û Amerîka berpirsiyariya xwe hilgirin û bi cidî kar bikin. Herwiha Tirkiye rawestînin û hesab jî jê bixwazin.”

`Em neçarin li dijî êrişên hovane, bersiveke xurt û bi bandor bidin`

Badran da xuyakirin ku Tirkiye li gorî peymana agirbestê tev nagere û gelek caran hewl da ku binpêkirinên xwe rewa bike û got, Piştî ku tirkiyê destora pêkanîna operasyona bejayî negirt, berê xwe da zêdekirina êrişan bi riya balafiran. Ji bo wê jî em neçarin li dijî êrişên hovane, bersiveke xurt û bi bandor bidin. Lewra mafê me ye ku em parastina xwe û gelê herêma xwe bikin û ev mafekî xwezayî ye.



`Em bi gel û hêza xwe ya leşkerî pir bawer in`

Bedran di berdewamiya axaftina xwe de destnîşan kir ku di vê çarçoveyê de divê hemû pêkhate û gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê helwesta xwe ya bi rihê şerê gelê şoreşgerî nîşan bidin û wiha got: “Divê gel şerê gelê şoreşgerî weke stratejiyeke ku pê hebûna xwe û destkeftiyên xwe biparêze, bibînin. Em bi gel û hêza xwe ya leşkerî pir bawer in. Ji bo wê jî eger rewş astengtir bibe, wê berxwedaneke mezin li hemberî dagîrkeran bê kirin.

Badran destnîşan kir ku êrişên dagîrkeriya Tirkî li ser herêmê destekeke didin terora û wiha domand: “Êrişên hovane yên daîrkeriya Tirkî li ser Kobanê û li ser hêzên me yên ku bi salan li dijî çeteyên DAIŞ’ê şer kirine û ji bo parastina cîhanê ji metirsiya DAIŞê pir li ber xwe dane, wek piştevaniyeke ji bo zindîkirina terorê tê dîtin. Niha bi dehhezaran çeteyên DAIŞ`ê li herêma me girtî ne. Ev çete eger di encama êrişên dagîrkeriyê de ji zindanan werin derxistin, dê bandoreke mezin li cîhanê bi giştî bikin.”

`Parastina gelê herêmê ji dagîrkeriya Tirkî berpirsyariyeke exlaqî`

Hevserokê Desteya Têkiliyên Derve Badran Çiya Kurd di dawiya axaftina xwe de wiha got: “Pêwîste civaka navdewletî û raya giştî ya navneteweyî li hember êrişên Tirkiyê yên ku wê li tevahiya herêmên Rojhilata Navîn bandorê bikin helwesteke zelal û bi biryar nîşan bidin. Parastina gelê herêmê ji dagîrkeriya Tirkî berpirsyariyeke exlaqî ya civaka navneteweyî ye. Em bang Ji hêzên çalak yên di dosyaya Sûriyê û Encûmena Ewlekariyê de dikin ku xebateke cidî û bibandor ji bo rawestandina Tirkiyê bikin û nehêlin herêm bikeve nav aloziyek mezintir.”



## ÊRIŞ WÊ BIDOMIN, LÊ ŞER NE MÎNA BERÊ YE

**DILYAR CIZÎRÎ**

Ev çend roj in dewleta Tirk bê navber êrişî herêmê dike. Di êrişên vê carê de sivîl û binesziyê li ber çavên herdû hêzên qaşo garantor Rûsiya û Amerîka dike armanc. Di heman demê de leşkerên hikûmeta Şamê yên sala 2019’an de di encama itîfaqa di navbera Rûsiya û Tirkiyê de hatin bi cihkirin, dibin armanc û heta niha bi dahan leşkeran jiyana xwe ji dest dane.
Di nava êrişan de kerwanê leşkerên Rûsiya yên li herêma Til Temir jî dema dixwest bi leşekerên hikûmeta Şamê ve biçin, bûn hedefa Artşa Tirk. Erdogan bi van nêzîkatiyan peyaman dide Rûsiya. Jê re dibêje, piştî şerê li Ûkranya te bandora xwe di dosya Sûriyayê de winda kiriye. Ji van nêzîkatiyên Tirkiyê û daxuyaniyên Erdogan diyar dibe, êdî Rûsiya ji bo rewşa li Sûriyê nema dikare Tirkiyê bide rawestandin.
Ji xwe Amerîka û Koalîsyona li dijî DAIŞ’ê jî piştî êrişa Serêkaniyê ya 2019’an xwe ji xeta sînor a bi Tirkiyê re vekişandiye. Wiha jî bi îdaya ew li wir nînin xwe ji mijarê dûr dûrdixin, niha jî bi bê dengiya xwe rê dide Tirkiê ya êrîşê. Lê ji ber dosya hevbeş a DAIŞ’ê ewê nikaribe mijarê paş guh bike.
Vê rewşê pirsa wê êriş bibe, an na di serê gelek kesan de gerandiye? Ma rabûna bi dehan balafirên şer û keşfê û topbaran û bombebarana li ser herêmê ne êrişkirine? Dewleta Tirk ji 2012’an li Qestela Efrînê, Şêxmeqsûda Helebê, Serêkaniyê û heta êrişa DAIŞ’ê ya li dijî herêmê êrişên wê ,ranewestiyan e. Bi dagirkirina Efrînê, Serêkaniyê û Girê Spî jî ev bi encam kiriye. Di nerîna min de Erdogan niha hewcedare êrişeke bejahî pêk bînin û ihtîmala mezin wê pêk bîne. Lê pirs ew e wê çawa pêk bînin? Wê li kur pêk bîne?
Li gorî xuya dike piştî plana teqîna Istenbolê mirov armanca dewleta Tirk baş dibîne. Erdogan û hikûmeta xwe ya amadekariya hilbijartinên têne payîn di 24’ê hizêranê de werin lidarxistin, dike, hewcedare rojeva civaka Tirkiyê bide guhertin. Kirîza aborî û siyasî ya hindir derxîne derve. Wiha jî di bin navê şer rêjeya dengên xwe zêde bike.
BI êrişa li ser herêmên Zap, Metîna û Avaşîn tevî bikaranîna çekên kîmyawî jî nikarîbû encaman bi dest bixe. Berûvajî leşkerên wê zêde têne kuştin. Ev jî destên dijberên Erdogan bi xurtir dike. Ji lewma niha ji her demê zêdetir hewcedarî rojev guhertinê ye. Bi taybet di demekê de opozisyona Tirkiyê hinekî xwe li dijî Erdogan komî ser hev kiriye. Nerîna min jî wê Erdogan êrişên xwe bidomîne, Amerîka û Rûsiya jî wê di helwestên xwe de dewam bin.
Ji bo wê jî em dinerin di van rojan de tevgera şaneyên DAIŞ’ê zêde jî zêde bûye. Di rojên pêş de jî wê hîn zêdetir bibe. Bi vê re jî wê Erdogan hewl bide Minbic û Kobanê ji hev qut bike.
Lê vê carê şer ne wekî berê be, ji ber hindirê Tirkiyê ne li ser heve, Tevî El-Nusra amade kirine, çeteyên Erdogan jî ne li ser hev in. ya giringtir jî amadekariyên QSD’ê ne



# ’Têkoşîna li dijî dagirkeran erkê her kurdekî xwedî wijdan e’

Ezher Ehmed diyar kir ku êrişên dagirkeriya Tirk bi erêkirina Rûsya, Amrîka û hikumeta Şamê tên kirin û got, îro ji her kurdekî xwedî wijdan tê xwestin ku li dijî êrişan têkoşînê bikin.

**Şaho Gabar/Qamişlo**

Dewleta Tirk a dagirker di çarçoveya sûcên rojane, plankirî yên domdar de, ji şeva 19`ê Mijdara 2022`yan ve êriş li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê da destpêkirin û heya niha ev êriş dewam dikin. Dagirkerî bi tang, tpo û balafirên şer êrişan li dijî herêmên ji Dêrik û heta Şehbayê pêk tîne. Di encamê de bi dehan welatî şehîd û birîndar bûne. Her wiha malên sivîlan, nexweşxane, dibistan, binsazî û cihên xizmetguzarî wekî stasyonên sotemenî, kehrebe, embarên genim û rêyên giştî jî tên bombekirin.

Derbarê êrişên dewleta Tirk ya dagirker yên ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê endamê Desteya Rêveber Ya Meclisa Sûriya Demokratîk Ezher Ehmed ji me re axivî.

Ezher Ehmed diyar kir ku armanca êrişên dagirkeriya Tirk yên ser qadên gerîla û Bakur û Rojhilatê Sûriyê, têkbirina fikrê azad e û wiha got: “Li Bakur û rojhilatê Sûriyê Projeya Biratiya Gelan pêş ketiye, li ser bingeha demokratiyê û avakirina civakeke azad, gelên herêmê xwe bi rêve dibin. Li van herêman fikrên demokratîk û azad pêşketin e, ji ber ku ev fikr ne li gor berjewendiyên dagirkeran e, ew hewil didin bi her şêwazî êrişî herêmê û gelên wê yên berxwedêr bikin.”

’Dagirker ji fikrên azad ditirsin ’

Ehmed da xuyakirin ku hikumeta AKP-MHP’ê ya faşîst hebûna projeyeke demokratîk li herêmê, li ser desthilatdariya xwe xeter dibîne û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Dewleta Tirk ya dagirker û tevayiya hêzên ku Kurdistan dagir kirine ji projeya Rêveberiya Xweser ya Domkratîk ditirsin û vê projeyê li ser desthiltdariya xwe ya ku li ser qirkirina gelan avabûye, xeter dibînin. Hêzên dagirker dizanin ku projeya Biratiya Gelan wê tevayiya planên wan yên dagirkirinê têk bibe, ji ber wê bi dijwarî êriş dikin.”

Ehmed da zanîn ku êrişên dagirkeriya Tirk yên ser herêmê bi erêkirina hêzên navneteweyî pêk tên û wiha dewam kir: “Êrişên dagirkeriya Tirk yên ser qadên Gerîla bi erêkirina hikumeta Iraqî û alîkariya hin aliyên qaşo dibêjin em kurdin, tên kirin. Herwiha êrişên wê yên li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî bi erêkirina Rûsya, Amrîka û hikumeta Şamê tên kirin. Tevayiya van hêzan ji bo berjewendiyên xwe, li dijî Rêveberiya Xweser planên qirêj dimeşînin. Her hêzek ji van hêzan dixwaze li gorî berjewendiyên xwe nexşeya Sûriyê bugherîne û xaka Sûriyê parçe bike.”

’Armanca êrişên dagirkeriya Tirk qirkirina gelan e’

Ehmed balkişand ser armanca hedfgrtina binsaziya herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji aliyê Dagirkeriya Tirk û wiha got: “Bi şoreşa Rojava re, herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê di aliyê aboriyê de pêş ket. Gelek projeyên ji bo xizmeta gelên herêmê hatin çêkirin û bingeheke aboriya civakê çêbû. Di êrişên dagirkeriya Tirk yên dawî de, nexweşxane, navendên betrolê, cihên belavkirina enerjiya, kargeha gazê û embarên genim bûn bûn armanca. Dagirkeriya Tirk bi êrişên ser binsaziya herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hewil dide ku Rêvberiya Xweser lawaz bike û gelên herêmê bi kirîzeke aborî pir zehmet re rûbirû bihêle, da ku gel koçber bibe û herêm were valakirin.”

’Rûsya û Amrîka hevkarên dagirkeran in’


Ehmed diyar kir ku Rûsya û Amrîka di qirkirina gelên herêmê de hevkarin û wiha got: “Rûsya û Amrîka qaşo li Sûriyê garentorin, lê bi erkê xwe yên exlaqî ranabin û çavên xwe ji kiryarên dijmirovî yên dewleta Tirk ya dagirker, digrin. Li pêş çavên wan dagirkeriya Tirk êrişî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dike û bi sedan mirovan qetil dike. lê herdem ew xwe bêdeng dikin. Dewleta Tirk ya dagirker di êrişên xwe yên dawî de, hin deverên nêzî navendên Koalsyona Navneteweyî jî kir armanc, ev diyar dike ku êriş bi erêkirina van hêzan pêk hatiye.”

’Piştgiriya Rêveberiya Xweser erkê her kurdekî xwedî wijdan e.’



Endamê Desteya Rêveber ya Meclisa Sûriya Demokratîk Ezher Ehmed bang li gelê Kurd kir ku li dijî êrişên dagirkeriya tirk asta berxwedanê bilind bikin û axaftina xwe wiha qedand: “Herkes gihiştiye baweriyeke ku hêzên li ser axa Sûriyê, tenê ji bo berjewendiyên xwe kar dikin û baweriya tu kesî bi van hêzan nemaye. Ji gelê Kurd yên li Kurdistan û her aliyekî cîhanê tê xwestin ku bi erkê xwe yê exlaqî rabin, li gorî hêviya şehîdên azadiyê bin û li gor derfeta xwe li dijî van êrîşan bisekinin. Ji her kurdekî xwedî wijdan tê xwestin ku di vê pêvajoya xeter de piştgiriya Rêveberiya Xweser bike. Têkoşîna li dijî dagirkeran erkê her kurdekî xwedî wijdan e”

## Tirkiye, li Sûrî hilweşandinê didomîne



**Zekî BEDRAN**

Êrîşên esmanî ên giran ya dewleta Tirkan hember bakûr û rojhilatê Sûrî hefteyek li paş xwe hêşt. Li gor daxwûyaniyên wan bi xwe, êrîşên esmanî ê herî berfireh ya salên dawî bûn. Ji 70`î zêdetir balafir di van êrîşande hatine bikarhanîn. Li hember wan hêzeke bê parastina esmanî hebû. Ji ber wê axa Sûrî bê tirs, weke qadeke manewra leşkerî bombebaran kirin. Herêma di bin êrîşande bu ne herêmeke çiyayî bû jî, erdek rast û deşt bû.
Hûndayiyên QSD pir kêm in. Hûndayiyên hene piranî sîvîl in. Gelê sîvîl jî, ji ber ne li bendê bûn ku bibin hedef û her wiha ji ber bê tecrûbebûn hûndayî hat dayîn. Li Dêrik’ê gel dema çûn cîhê bombebaranê binerin û ji birîndaran re alîkarbin, di bombebarana dûyem de komek şehîd ketin. Dewleta Tirkan bî gîştî cîhên ku dikeve nava çarçoveya sûcên şer lêdaye. Li Ukrayna dema Rusya li sîvîlan xist û avahiyên binî ya bajaran dema lêda, hemberî wê delîl hatin komkirin û dadgeha navnetevîde ji bo doz bê vekirin ketin nava tevgerê. Dewleta Tirkan jî heman tişt kir lê hember wî bêdengî û destek heye. Dewleta Tirkan li bakûr û rojhilatê Sûrî her tim êrîşan dike. Ji bo herêm bê îstîqrar bibe û gel koçber bibe qet nesekinî. Hemû cîhan rakir ser piyan. Pirsgirêk rakir civîna NATO û hemû civînên navnetevî. Herêma ku li Sûrî herî demokratîk û herî bi hizûr e weke korîdora teror, navenda gef da nîşandan. Vê yekê bizanebûn û stratejiyek yekgirtî di nava projeya qirkirina Kurdan de kir. Çi dibe bila bibe, Kurd ti carî divê nebin xwedan statû û divê bi nasnameya xwe jiyan nekin.
Rusya ev êrîşa neheq û zalimane çima erêkir? Dihat zanîn ku Putin demekî dirêje bi Erdogan re bazarî dikir. Dewleta Tirkan di civîna Tehran`ê û Soçî de ji bo biryara êrîşê derxîne pir israr kir, lê destekê ku dixwest nekarî bigre. Rusya erê neke Tirkiyê nikare êrîş bike. Ev yek pir zelale. Ji ber ku kontrola qada esmanî ji Kobanê û rojavayê firatê bin berpirsiyariya Rusya de ye. Rusya li Ukrayna tengav bûye. Tirkiyê jî bi dijminayiya Kurdan têr nabe. Erdogan dixwaze ji nakokiyên navbera DYA, Ewropa û Rusya sûdê bigre û ji êrîşê îcaze bigre. Dawî de ji bo êrîşên esmanî hem ji Rusya hemjî ji DYA û NATO îcaze girt.
Rusya beriya naha daxwûyaniyên xwe de digot ‘’QSD, dema Tirkiyê êrîş bike xwe nîzîkî Şamê dike, dema xeteriya êrîşê nema cardin xwe nîzîkî DYA dike’’. Lê Rusya bixwe jî, ji bo QSD û rêveberiya Şam`ê lihev bikin giraniyê xwe nedanî. Niha hêzên leşkerî ya Rusya û Şam`ê li herêma Rêveberiyê Xweserin. Xeta sînor bicîh bûne. Dema dewleta Tirkan êrîş kir rûxmî ku hêjmarek zêde leşkerê Sûrî hatibû lêdan jî cardin helwestek dîyar nekirin. Rusya ji vir û wiha nikare bêje dema tengav dibin xwe nîzîkî Şam`ê dikin. Kurd û rêveberiyê xweser ji xwe li ser xeta sînor bi Şam`ê re bihevre ne. Rûxmî vê Rusya êrîşê dewleta Tirkan çima erê kir? Me gotibû Tirkiyê bi Rusya re lihev neke nikare vê yekê bike. ji ber ku Rusya û Şam hêzên wan ê parastina esmanî hene. Ev çekên parastina esmanî hatibûn sekinandin. Di rastiya xwe de Rusya Kurdan, QSD bi darê Tirkan xwast bikşîne li ser xeta xwe. Vê yekê weke polîtîka ji xwe re esas girtine. Kurdan bi Tirkan, Tirkan jî bi Kurdan tehdîd dikin. Baş fêm kirine ku Erdogan alîyateke bi kêr e. Bi hamleyek berfireh û bi bandor ya cezakirinê xwastin Kurdan tengav bikin û bihêlin ku Kurd xwe bispêre Şam`ê û Rusya. Li gor wan encamê vê êrîşê giran Kurd wê pes bikin û gav paşde bavêjin, û herin ber lingê Rusya û Şam`ê. Lê ev yek çênebû. Bi rastî DYA û Rusya jî têde gelek hêz ecêb man. Ne li bendê bûn ku rêveberiya xweser ew kasî berxwe bide û xwuynsar be. Bi baldarî lê binerin rojên destpêkê ya êrîşan DYA û Rusya qet helwestek dîyar nekirin. Hêzên mezin weke zimanê wan hatibû qutkirin.
Li ber deriyê navenda Emerîka bîrên petrolê, depoyên genim, fabrîqeyên gazê û avahîyên binesazî hatin îmha kirin. DYA û Rusya hemû tenê temaşe kirin. Dewleta Tirkan bi eşkereyî kiryarê xwe diparêze û ragihandina Tirkan bi pesndayînê van sûcên şer kirin nûçe û belav kirin.
Ew hêzên veşartî yê ku dewleta Tirkan îdare dikin, dîtin ku ji êrîşên esmanî encamên hevî dikirin nekarîn bigrin. Niha jî dibêjin emê ji bejahî dagirkerî destpê bikin. Lê her kes dîtin ku, rêveberiya xweser pariyek pir hesan nîne. Dewleta Tirkan ji leşkerên xwe zêdetir ew çeteyên li dora xwe kom kiriye wê derxin pêş. Ew jî dizanin ku wê hûndayiyên giran bidin. Gelê Rojava û bakûr û rojhilatê Sûrî dan xwuya kirin ku ji bo şer amadene û ewê axa xwe neterikînin. Pir eşkereye ku ewê encamê şer diyar bike ê ku şer bikin û li berxwebidin ewin. Ger civak bi biryar tevbigere û hêzên berxwedanê jî karê xwe ciddî bikin, Erdogan li şûna qerta desthilatdarî wê hewa bigre.
Dewleta Tirkan ji bo herêmên rêveberiyê xweser daîmî nebin çi destê wî bê wê bike. Her dem bi êrîşkirinê dixwaze li herêmê bê îstîqrarî avabike û bi zext gel bide koçkirin. Ji bo raya gîştî ya derve jî bi çiroka fikarên me yê ewlekarî hene dixwaze êrîşên xwe veşêre. Balafir û artêşên mezin yê Kurdan nînin. Dikarin di nav axa Tirkiyê de li gor xwastekê xwe tedbîrên xwe bigrin. Di kîjan hiqûqê de heye, axa welateke din dagir bikî, gelê wî welatî bi zext bidî koçberkirin û wiha ewlehiyê xwe avabikî. Dewletên mezin ji bo berjewendiyên xwe dibin şirîkê vê zordariyê. Gelên Sûrî edî di zanebûna vê yekê de ne. Tirkiye Sûrî bir hilweşandinê, heta niha jî destê xwe nakşîne. Hilweşandinê didomîne.